EZÎZ XEMCIVÎN

# ZINDANA BIÇÛK

Helbest

www.amude.com

Zindana Biçûk

**Helbestvan: Ezîz Xemcivîn**

Derhêner û çapa dijîtal
**Sîrwan Hecî Berko**

**Ji weşanên Malpera Amûdê**
**Hejmar: 18**

www.amude.com
info@amude.com

**Hamû mafên çapê parastî ne.**
*© Ezîz Xemcivîn û Malpera Amûdê ( 01/2003 )*

# Hey leheng

Gava heyvê
xwe sipart lehengiya te …
peyvên te, bi kenê
şevê re vêketin…
gotin :
hey ahora mezda,
yezdanê hêzê
bi çînî tu tovê,
şîn tê
bi destê te şîn tê …
û niha
tu dê yî ,
tu bavî
hey sermeyandarê mezin …
cîhan
li ber te bû ye pêtek ,
xurirst ava bû ye ,
qonax bi qonax
xwe sipartiye ser kopalê te …





hey jîn ,
hey hîn ,
û hey evîn…
germ û serme
darê xwe li ber te
şikandin ..!!
tirsa qels ,
newêrekiya gavan
nikarin berê xwe
bidin çiyayê te ;
hey çiya ,
hey hêz ,
hey birûska peyvê ,
nav û nîşanê te
li meydanê kêferatê ne,
destek bi gurz e ,
destek bi kuling e ,
û her destarê dilan
sawa te di hêre…!!
çelengiya te ,
mêrxasî ,
hevrikê ba û bahozê
li panava asîmên
stûnek li dar e ,
rojhilat û rojava

te dan ser

her du qiloçên xwe …
hey mêj û bûrî ,

hey niha ,

hey paşeroj ,

gulav ji banga te bariya

û bela bû … !!

hevîrê jînê

di koda çavên te de

tirş bû…

li ser kela dilê te ,

bû nan … !!

hey nan , hey agir ,

hey mêrkujê pezkovî ;

ew pezkoviyê ronîkuj..!!

awazê di jana

birîndar de kelandî ,

û lehya bêriyên evîndar …

hey çilka lezgîn ,

hey jînxwaz

bi armanca serketinê

berê te wa li hêkê ronî bû ;

dara te ber girt,

doza te zelal bû ,

te kember

li pêkenînê pêça..!!





ji denê jînê

meya serbestiyê te fir kir ;

bawerî , mujde ,

her bawerî .

nama te ey mirov,

nama pîroz

diyariya rokê hinart…!!

## Dûriyê

Dûriyê va ez berê xwe

didim te ,

û her tiştî dizanim !!

jîna tal

ezê kengî karibim ?

dûr ji vê taliyê

taliyeke din

bi noşim… ?

16/2/2000
şam





## Zindana biçûk

Zindana biçûk

ez bi gorî dengê bilbilim …

ji dûr tê …

ji dûr tê … !!

zindana biçûk

ez bi gorî dengê ZÎNÊ me

ji nalînê tê ,

bi hisretê re dilîze

li nêv sawîrê mijgûlan

bi çîvçîve…

zindana biçûk

wey li mala min zave be !!?

li bin roniyaaaaaa

pencera bilind,

min tûtûk anî

û ji dest xwe berda

ew bûk ,

ax ax zindana biçûk

29/2/2000

Abû debî

## Pencerê

Pencerê ;

çîçek ji dilê te ne,

gul û nesrîn

li dor te ne..

lê çavên reş

ne xuyane , pencerê..!!

bi zimanê pûç û lal

tê çawa dil bigehîne ?

bi ariya sar,

tê çawa baweriyê bi kelîne ?

pencerê bes xwe bi xapînî !!

ji çavên ziwa,

ji bil çavên reş

hêsran li ber tîrêjên rokê

ne çirisîne !!

pencerê

parêzvana roniyê

gelo te ha ji çavêd reş nîne ?

sibeh û êvar

li pey hev di bezin bê jimar ,

pencerê;

biskên zêrîn nabûrin û ah û nalîn

li dil bûne hezar…. !!

29/2//2000





## Yê zane

Gelo barê min çiyaye .. !!

û kesek nîne

zimanê derdê min bigehê ..!!

ez dixwazim bêjim;

ji kê re bibêjim !!

kesek nîne,

baranê ji ewrê xeman

bi ser de birêjim … !!

li welatê bê nan û xwê ,

bê baran , li hêtûna xerîbiyê ,

hêviyên min basko kirîne …!!

wekû hemû kesan ,

berê dîdariya min li qelêç bû …

wekû hemû kesan ,

min dixwest ;

li ber peravê kewserê

bihna buhiştê ,

bidim ber pozê

zarok û zêçan û dîlberê …

şerma tarî findê ,

ji şahiya çavên bendewar bifirînim …

kenê li hev pêçayî ,

**li rez û baxên armancê veçirînim ,**

**{rawestaneke biçûk} ..!!**

**ev xewnerojk ,**

**li şûvên pirsan hîn tovin ;**

**tîne , lê ne bê hêvî ne ..!!**

**cotkarî dikare sînga xwe veke ;**

**çivîkên êrîşker**

**ji ser libokan bifirîne .!!**

**hey dem û dewranê ,**

**dar heye ,**

**av heye ,**

**û aş heye ,**

**zana ewe**

**yê ko karibe rast bi gerîne ..!!**

**31/3/2000**





## Kelekê

**keleka windayî ,**

**di derya xapan de**

**li ber bayê dîn ,**

**li ber pêlên har ,**

**tu di kulmişî .. !!**

**çav zirdoq kirine ,**

**û tayekî tu nabînî ….!!**

**dest bilindin bi bal xwestekê de ..!!**

**ka ... ka …!!**

**destê felekê kurt bûye ;**

**û na gihê te ,**

**li bin avê , li ser avê ,**

**bi jînê û ne jînê ,**

**xatir xwestinê û ne xwestinê …!!**

**hey dibijok ;**

**çavê te ketiye**

**nikilê newresan ;**

**çima ?**

**te wek wan**

**biçûk masiyan hilnînin ..?**

**ji neyînê**

**bi be heyînê ,**

**bê ko ji jînê**

**bi be ne jînê … !!**

**keleka malik wêran ,**

**gerînekê avê**

**mîna bahoza dilê kirêtin ,**

**na pirsin , nadin keysê ,**

**basikên tilûran dişekînin …**

**darên ciwan , ji xuristê**

**koka li hev badayî ,**

**û rehên dilên pola hildikin ..!!**

**kelekê**

**tu dizanî perav dûre … ?**

**kelekê mijê dîtin birriye !!**

**sawîr tê ,**

**Gamasî tê ,**

**hildigire laşê nazik ,**

**mixabin … mixabin …**

**pişt bi sitriye ,**

**dîsa sawîr tê ,**

**neheng tê ,**

**kelek di şikefta dev de**

**gepek bê hestiye ..!!**

**mûrane …**

**mûrane …**



Ezîz Xemcivîn: Zindana biçûk

**pêlekê te bilind kir ;**

**pêlekê te avêt … !!**

**sawîre … ? ne sawîre …?**

**Xewne … ? ne xewne …?**

**derya xapan ne hênike .. ;**

**ne rewane ..;**

**û bê mecale .. ;**

**kesî kesan lê nîne …!!**

**3/4/2000**

# Şeva reş

Te hay jê heye ,

çerx gerya ,

“û lingê şemitî

hevalê wî nîne”?

te hay jê heye ,

spîde û berbang

li dawiya şeva wî nîne ?

te hay jê heye ,

tiriyê li ber Berazan

tu halê wî nîne ?

“şeva reş ji êvar de reş e”

nema hêjaye

bi nivêj û ayetan,

şopê bigerîne… !!

29/2/2000





# Şîrmij

Gava te rê berda !!

min dizanî bû ,

baxçê gulan ji dest çû.. !!

çiqas bi dî ser rêka kadizan ;

çavêd matmayî

ronî û rewrewkê tev li hev dicû !!

te rê berda !!

baxçê gulan rê ne diyare…!!

tu bi xwe korî ;

şevreşkî, û şîrmijî .. !!1

te bi destê mafê xwe ne girt ;

û buharê

wa ne diviya…!!

serê te li kevir ket ;

dasê sinbilê şîn

ji lema te birrî … !!

hey şîrmij ,

paşdemayî ,

cîhan û felek ;

li stêra te geriya… !! 29/2/2000

# xewnê

Xewnê şêrînê ,

çiqas xweşî ,

gava tu li van

çend hezar hezar

kîlomitran na pirsî

ne…çol , ne…rê … ,

ne…çiyayên qûmê…,

û ne deryayê birînê… !!

xewnê şêrînê,

çiqas xweşî ,

li nav zarokan

tu min datînî ;

li nêv lîstikên {Jîn û Hînê} ,

li hembêza odê ;

li warê dê û bav ;

xwişk û bira û Nesrînê…!!

xewnê , bilindê , buhayê ,

ma tu baskên {Buraqêyî} ?

şevekê min bi yezdanan ve

digehînê..?

û laleşê seredan dikim …!!

li nêv gul û nêrgizan;





li hewşa xwe ,

nexşê dûriyê,

bi min di wênînê…!!

şevbuhêrkek li gel yarê,

em vêketîne

li ber kaniyê , li ber kaniyê

perwanan li xwe dicivînin ;

bilbilê welêt

ji hêlînê bi şadî difirînin…!!

xema gula bihriyê ;

ew jî weke me dixwînê…!!

xewnê şêrînê ,

bela salmidêr tu xewnbî ,

bela buhar

ji awira te ne reve ,

bela dîrok û dem bibeze ,

bela perde biçire ,

bela cawê reş

ji ber çavan birize …!!

bela xewnê şêrînê ;

rewrewka dildaran

bibe deryake evînê …!!

bela {Sitî xatûn}

li gel {Tacidîn} agirê keserê ,

bi kîlomitran ve dînê…!!

## Rengê dil

Çendî ciwanin,
bax û gulistan
qesr û qonax
û birc û eywan…!!
Çendî dil li ber tevan
dinale ,
digrî û dibêje:
zindan e….zindan … !!
çendî di êşê de mexele !!
sar û poşmane…
ne kulîlkên li dorê
bi kurmancî dizanin… !!
ne rê û cade ,
stranên cezîrê digehên… !!
ziman pûçe,
awir perîşane…
bê armanc digere… !!
sibehîn ta êvarê,
meşka dil dikilê…
pênûs dimîne
bi hisreta nîvişk
mîna carê berê…!!





{rista me tê perîşan,
nezma me tê mişeweş}
ev e rengê dil îro ,
barê çiyakî hildigire ,
di kele …di fûre…
bela tî be ,
bela birçî be ,
lê bela
ne bê xwedî be… !!

7/3/2000

## Oksana

**Sînga te zozan e ,**

**ser datînim ser**

**dil datînim ber ;**

**du çiyayên qeşê**

**lêvên min ji xweber**

**dimijin cot û fer…!!**

**Oksana,**

**ziwane, bê deşt û buharin …!!**

**tilî li nêv kulîlkan**

**bêzarin… !!**

**nakin tevger.. !!**

**şeveke buhiştî**

**qaza sipî ,**

**asîmanê wê girtiye…**

**Oksana**

**di hembêzê de,**

**heya sibê**

**bibil di hêlînê de ,**

**hêlîn li ser şaxê**

**li ber ba diheje ;**

**lê naçe ji rê… !!**

**xuyaye ;**



Ezîz Xemcivîn: Zindana biçûk

**ne ew gul e ..!!**

**buhar bi kule !!**

**xuyaye,**

**lem bê rewaye ,**

**Oksana;**

**ji refê wî cudaye … !!**

**her tilûr**

**xweşiyê digehê ,**

**û nama dildariyê**

**li ser porê kej distirê …!!**

**Oksana**

**ev navê şêrîn ,**

**hey mûma di mûmdana**

**xwe de vêketî …**

**roniya te diyare ,**

**stêra şeva bendewar ;**

**dil , dilê min geş nake…!!**

**hêvîdarim ,**

**tu bes bêjî :{no û yes} !!**

**dilê min ji êvar de ,**

**dibêje te:**

**{good night}**

**şeva te xweş… !!**

**7/3/2000**

## Derya rewrewkê

**Derya rewrewkê…**

**dîsa li zindana biçûk**

**vegeryam …!!**

**dîsa çar dîwar ;**

**çar çiya,**

**min da ser**

**rêka dûr…**

**ne rengê berfa welêt,**

**ne sînorekî xwiya dibînim…**

**tev de bûn**

**hêviyên winda… !!**

**dengê hevalê min ,**

**li ber guhê min zîze.**

**do min ew dît,**

**do bû….jiyan bû…**

**hîv li govenda xwe gerand…!!**

**hovk û semawend,**

**cejn û sersal geş bûne….!!**

**yar bi dest girt,**

**û li nik hev**

**du kewên kedîne…**





**hem tej û cil**

**li ber pê raxistîne …!!**

**stêr ji nêv tariya xwe**

**bi ber min de hat …**

**cegera Vînos,**

**ji destê min çû.. !!**

**lê pêjn û saw**

**şiyarin… şiyar …!!**

**dîsa dengê hevalê min tê ,**

**dîsa guh miçim ;**

**kengî ziringîniya kilîtê bê ,**

**hew xwe digrim**

**rawestan li can nîne ..!!**

**seyranên sawîr û hestan**

**di derya rewrewkê de**

**ev roj û hemû roj,**

**birûsk in ,**

**pêt in ,**

**agir in ,**

**ziyanên dîliyêne,**

**girtîgeha cih û warin…!!**

**sê dan**

**ev derdên giran,**

**peyveke vêketî dernayê…!!**

**ev dil şewatî,**

hineriya te li min … ;

ezê çi bikim ?

dîsa vegeriyam

li te zindana biçûk… ?

13/3/2000





## Mijûlî

Ev bû deh sal ,

{Helbest}

li ser danê te dijî …!!

ew bû temen,

hebû jiyan,

hebû evîn,

serxoşî , sermestî

mijûliya hiş û mejî …

kengî awir bû nîvişk..?

bû şeşreng..?

matmayî ma

li lîska hesp û fîl…!!

hew dest

bi tihna hev gihan ,

xewnerojkên serbest

beziyan buhiştê…!!

li ber destê ZERADEŞT

şikandin sistema dûriyê ,

çirandin pelê mitr û mîl… !!

hogirî hat sema ,

riwê te sor û sipî veda … !!

**sê reng**

**ji wan dêmên te ,**

**kanî û solav û buhar**

**di pîvan…!!**

**havîngeha{Cezîrî}**

**dergeh vebû ,**

**hîva mêvan**

**ronî da ber derî…**

**fermo**

**nerîn bazê ,**

**wekû mujda evîn**

**ji aso diyar kir…**

**li gulîstanan ,**

**li çîmen û zevî ,**

**li zindanan…!!**

**Pişkojên dildaran bişkivîn ,**

**Keleka te giha peravê ,**

**û şoreşa helbestê**

**hêmin ne bû…!!**

**jîn tev bibûre ,**

**xwîn ziwa bibe ,**

**ji gorê wê ronî bide… !!**

**12/3/2000**





## Buhar dibe nîşan

**Dîwarê ava bû ,**

**li navbera herdu dilan…**

**xaka fire ,**

**ji guhan deng girtiye…**

**nerîn şikest ,**

**li saya dûrbînê…**

**nabînim ,**

**ez û ew**

**şev û roj ,**

**mane li ber**

**kunca hevdîtina stewr…!!**

**heye nexşek ,**

**heye rewşek ,**

**li aniya tavikê ,**

**dîrokê zîvirî**

**û pelê gazinan pêça…!!**

**Ji serê burcê**

**Sawîrê demê firiya .**

**Li deşta xewnê danî ,**

**Bi hêz**

**Li ser basikên xwe :**

**Ji bajarê muxribê**

**Zîn li ber textê**

**Memo danî… !!**

**ew çavê kor**

**li hêviya Yûsif vebû…!!**

**tîbûna bendewariyê çû…!!**

**Ji nişkave ;**

**Siyamendê silîvî**

**berê xwe da oxirê**

**û pişta xwe da felekê…!!**

**hey heye**

**rewşeke wisa,**

**wêne bi payîzê re zer bûye…!!**

**gustîlk bi peymanê**

**nû dibe xuya…**

**destê xwe hilde xanim ;**

**tu nikarî bikişînî çiya…!!**

**barê giran**

**nazikbûnê diguvêşe…!!**

**ez bawerim**

**cihokên dil vebûne… ;**

**kî tî bû… ?**

**kê firek vexwar…?**

**Perwane kulîlkê dimije**

**buhar nexşê perwanê dibêje…!!**

**destê dewl dahişte bîrê ;**





**çend caran**

**ji xurista evîna te ,**

**di kişîne ji bîrê .. !!**

**dewla me av girt ,**

**û hogiriya me**

**li hewdê gulan dibe berbang..!!**

**awir dibin yek ,**

**berê xwe didin hêviyê**

**bi hev dighên armancê ,**

**sal dizîvire ;**

**û buhar dibe nîşan…!!**

**13/3/2000**

## Helepçe

Helepçe ,
Kevoka birîndar
{ 12 tîrêjsal }
dil û hinav hîn kul in ,
bi derd û êşê di kewin…!!
dîroka şermezar
tu dikarî çi veşêrî…?
pelê reş
pênc hezar rewan diyarin ;
stêr in , geş in …
pelê reş vekiriye
sînga te nîşan kiriye… !!
serê daketî ,
berê guhertî ,
li wêneyê ciwan
kevir zîvirîn …!!
li deşta bê ba,
bihna sêva,
li çiyayê dilşewat ,
hawara helepça
kevoka birîndar ,
bû nalîn





dêwê mirinê lezgîne ,
ketûber da ber xwe
derasa zadê jînê di lezîne …!!
pênc hezar sinbil ,
dîroka şermezar ,
dûmana zer belabû ..
li pişikên mendalan ,
dê û bav ,
û pîr û kalan
bela bû… bela bû…
rewan li dû hev ;
zincîra mirinê ,
pêt û rivîn
ji volqana azeriyê derçû… !!
qiloçê gayê dinê qerimî ,
berê xwe guhart ,
cîhaneke bê deng hejiya… !!!?
ziman lal bûn ,
çavên hebûn ,
xewê da ser wan ,
û xilmaş xwe dane xewê…!!
deng ket kerka guhê ker ;
dunyayê … dunyayê …
kê dît…?
kê bihîst…?

**!!!!    !!!!**

**heger vestîvalê {Rok} ba ,**

**straneke girîng bû…!!1**

**şanoyeke cîhanî ,**

**li ber çavan diyar**

**bihna sêva ,**

**dûmana zer**

**kî dibîne.. ?**

**derhêner di kene**

**cadûbaze ew ,**

**çav û dilê temaşevanan**

**şaş di hêle….!!!**

**berjewendî ,**

**her tiştî di xapîne…!!**

**Zadê bê bihn û ba**

**li xakê ket, serî danîn ,**

**laşên ciwan**

**mîna meşka dagirtî ,**

**sêpî şikest**

**kilmeşkê jî bû meşk… !!**

**çivîk ji jor bi hêz**

**xwe avête dilê meşkê…!!**

**rojî û nimêj ,**

**û banga melan**

**li cîhana bê ba ,**





**germ û nixumandî ma… !!**

**ne balkêşbû li bal**

**birayên me yên misilman ,**

**heger Bosnî yan Kosovî bana ;**

**wê kongirekî alîkarî heba :**

**{misilmanê me derbiderin} !!**

**şerme ey dîrok ;**

**serê te di axê de ,**

**û paşiya te li dere… !!**

**şerme … şerme …**

**hêvî di dûmana zer de vemire .**

**xewnên evîndaran ,**

**bê çare xwe di veşêrin.. !!**

**buhara şadîman**

**bê reng li me di bûre…!!**

**Ma pelê reş**

**tê wisan bimînî ?**

**pênc hezar şitlên gulan**

**li gulzarên evînê ,**

**ala bilind**

**reş rengê xwe li ba dibe !!**

**Rewanên pîroz**

**hey ker û lalnoooooooo !!**

**hîmên azadiyê di karin ,**

**dîrokeke nû ava bikin …!!**

**baran buharê xweş dike ,**

**gemiya Nûh ,**

**di kare jînekê rizgar bike !!**

**û gava herdu dest ,**

**bi hev re bin ;**

**di karin alekê bilind bikin…!!**

**16/3/2000**





## Dîlê hesreta Xecê

**Hemî caran**

**pirsa dîn ,**

**ne hêle bînahî**

**ji sawîran revê bike ...!!**

**di gel min derya bibîne ,**

**dibe ko rok**

**vê êvarê lêvan sor bike...!!**

**li ser latê rûniştî ,**

**hest bilind bû , kûr bû ;**

**pêlan ew şûştî...!!**

**du pêt ji rû keniyan ,**

**destê min li dor gerdenê**

**cam û mircanan**

**şahiya me pîvan....**

**perwîn li jor**

**bendewariyê dike ,**

**çiya hêmin bû ,**

**kevoka min lîsa li ciya…!!**

**bi ber de çûm ,**

**lêv şekirê bi xunavî**

**peyv ji dev bariyan…**

**tu bûyî**

**wêne û sawîr ,**

**li tabloya hiş û mejî …!!**

**kewê ;**

**li ser zinarê dil cî girtî…**

**bi bask û çengan**

**xewnerojkên min pêçan…!!**

**destek da hîvê ,**

**destek da serê min ,**

**li ser çogê hejand…**

**ramanan berê**

**mijûlî di kirin ;**

**hin bûn aho ,**

**li ser pêlên xewnê di lîstin…!!**

**dilê min wek mendalekî**

**bê dan û standin ,**

**di pêçeka evînê de**

**bê tevger ma…!!**

**bê çare ,**

**ket landika xeman ,**

**temen da ber hêviyê ,**

**û dîlê hesreta Xecê**

**li ser sîpan ;**

**li dû pez koviyan**

**her û her ma…!!**





## Semawend

**Ez bêriya dengê**

**dilê te dikim...**

**hogirim ,**

**li şevan şevîndarim..**

**li ber bihna şevnemê ,**

**şivanê gula xwe me..**

**ezê bêjim :**

**û morîka xewê**

**ji guhê buharê derînim ;**

**bela dengê zelal**

**li ber bê here û here...**

**bela kew**

**li zinarê derdan**

**namê bi ke dere ,**

**xweziya veşartî**

**bi refê zozên re rêke...**

**hegr evînê ;**

**cîhan girtiye..**

**rok ji peyvên te**

**hilat û belabû !!**

**li saya sorgulan**

**li aramê ,**

**li pêlên bêriyan..**

**ko me bi civînin;**

**li semawenda**

**Feqê teyran û dilberê..!!**





## Nerînê

**Nerînê…**

**Di beze .. diçe dûr…**

**û her di bêje:**

**ez giham ;**

**çeng dibe…!!**

**“ez li ku derê,**

**û mala bavê li ku derê “**

**meşwarê dirêj**

**bi şahî , nerînê**

**kêlîkin…!!**

**lê bi dijwarî**

**kêlîk sal in..**

**ev dem û hemû dem ,**

**qonaxên pîvana wan ;**

**aram û qehr û derd in … !!**

**xwîn di kele ,**

**taya dêw di can de di xebite…!!**

**nerînê nêçîrvana bazan**

**dehfa li ber piyê keleşan…**

**sêwîka li ber dîwaran ,**

**tê kengî ,**

gepa nan bi dest xe ?

çi hale ?

bi awiran

tu welatên tariyê di kolî !!

li pey tilûrên şevê difirî…

lê meydana tariyê dijware…

û basikên te ;

nû şînin… , teze ne .., !!

şeva te sar e

û zindana biçûk

mehderê li te nake …!!

5/4/2000





## Diya jînê

Diya jînê..

hevala jîna min ,

hevala derd û kulan ,

û kêf û şahiyê .. !!

kulîlka buhara min…

ev çend sal in

em li du rexên cuda ne,

çemê bêriyan

ji çiyayên pirsan di herike…

ava xurt pêlan di de…,

û me li hespê rewrewkê

siwar dike …

dibe ko roj

bi dijwarî di bûrin ,

lê bîr û bawerî her ew e ,

di cihokên xwe de di gerin…

hûn di bîra min de ne ;

JÎN û HÎN û NESRÎN

ez bêriya we dikim…

tev ko ,

bi şev û roj

**kêlîk bi kêlîk**

**hûn bi min re ne …**

**guhar in**

**di guhê min de ne ,**

**pênûs in**

**li nav tiliyên min in..**

**û xwîn û jîn in,**

**di berdewamiya**

**dilê ko ji bo we dijî…!!**

**6/4/2000**





## Dilo

**Payîze ..;**

**xurist xemgîn bûye**

**evîndar pişt daye demê.. ;**

**û kat li pelan di bûre…!!**

**Payîze .. ;**

**tilûr koça xwe dikin ..**

**dilê bi rima demê birîndar ;**

**dilê ko di derya**

**xemê de dîl bûye …**

**çi kenê pencerane**

**li halê wî tê …!!**

**Ê poşman**

**her tu dimînî dilo… !!**

**çiyayê bê hêz**

**li ber topên awiran ,**

**çiyayê bê hêz**

**li bin ewrê gazinan ,**

**ne xewê , ne xwarinê …,**

**ne zimanekî raste rê ..,**

**û ne hevalekî dil şewat**

**tu dibînî….!! Dilo**

**payîze ..,**

**evîndaro ,**

toz û babelîskên

li hêviyên te rabûne…

ketine gerdeneke tal ,

ji rêka dirust , çûne

kaşkaşokên westandinê…!!

Xuyaye;

tu bûyî gayekî pîr ;

şivên zemanan

pişta hêza te kolane .. !!

û her xêzên te xwar mane ..

payîze ;

te cotê xwe berda ,

tovê te çand ,

heya niha

ev tovê pûç ,

heya bi çivîkan lê daqûl nayê ..!!

xuyaye ;

tu gelekî westiyayî ..?

lê ev e dadgeha demê..

ê ket çima ..?

ê rabû hema ..?

stemkar e .. stemkar e ..

li rokê na nere…

li şevê na nere ..

ne roj , ne şev





kî di kare , bê ronî ,

bê tarî bijî…?

ne sar lê tê ,

ne germ lê tê ,

ev e dadgeha paş demê..

heger lat be ;

gerek ji ber awirên

peyvan bi şikesta…?

heger pola be ,

gerek ji ber

pirsên perîşan bi hile…?

Payîze ; na bûre ..

payîze ;

berx û berandîr nêçîrin..!!

gur li newalan

bi şahî di zûre …!!

Dilo ;

hîn hespê tevgera te

ne westiyaye…

tev ko tî bûye , birçî bûye

heger berê wî têkeve rojava..

û bihna dîlberê;

li ber pozê wî be

wê te bi gehîne …!!

## Şensê min

Hey marê
di nav qamirê de,
ez berê xwe didim ku derê ,
berî min tu li wirî …
rêka dûr ,
piyên min li ser şikestin .
xwêdana salan
li ser herikî ,
payebilindî ket
û her te
felek li min har kiriye…
şensê bê bext û ûjdan ,
bi rû reşî ;
te guhê xwe girtiye .. !!
ezê çawa
ji stema te rizgar bibim ?
benê te li gerdenê girêdayî ,
pir asê ye .
bi xwedêkî hinekî vezilînî.. ?
bela ez bi xêra te
çavekî li cîhanê vekim . !!
gulpek av bi ser





gepa ziwa de vexum ..
carekê tenê ,
rojekê tenê ,
kêlîkekê tenê ,
ez sipasdarim
ji wê roniya ko bidî ,
da doza min
li tariya şevê ne likumî ..!!
û sîwana te ,
min ji dûrbîna zemên vedizî..
ez sipasdarim
ji parastina ko tu bikî …
berî ez biçim ,
û koça xwe bikim ,
di xwazim tu jiyanê
bi min şêrîn bikî …!!
avekê hênik
di germa kêferatê de ,
bi ser lêvan de dakî..
devê xwe vekim û bêjim :
dema min çû ,
zarokên min
li şûna çira minî bê ronî
mûm bimînin ..!!
erê ez donê wê bûm ,

lê her min berê xwe da te ,
min tu tişt ne di dît…
şensê min ,
heyv û stêr
bi hev şanekirin ,
te ewrê tarî
li roj û şevan derkirin…
te ez avêtim
beyabanê windabûnê ,
hirç û hovan ez birim …!!
ez dizanim hîn dilê te
hênik ne bû ye .. !!
hîn jî kirêt e …
keko ;
ma ji dojê wir de ,
bi ku de
tu dixwazî min bi bî ..?

9/4/2000





## Dîlber

Zengilê evîna te ,
dengê wî ,,,
bi hênkaya şevê re
Şivanekî ;
weke min şiyar
ageh dike….
ji nav wan darên
Serê kaniyê,
ji ber wê ava sar,
ya ko dilê me herdiwan
dike nav çavê gulekê…
dike pênûsa helbestvanekî,
peyv bi peyv
li buhara dildaran
belav dike…
dasîtanên şeva qedrê,
û gihandina yezdanan ;
bi stêrk û morîkên
sînoran di rêse…
kenê perwînan
bakur û başûr
bi me di de zanîn..
li hîvê binere

û pirsa evîndar

ji ergewaniya lêvên xwe bi de…!!

bi de cama tenik,

bi de destê nazik,

dirêj bike…;

dibe bigehê destê min ,

tev bi de , tev bi de ;

tihna dilê xwe

û hêviyên pêk nehatî

bike xunav,

li rûpelên baweriyê

bike pûlik ,

posta me niha bayê hênike…

gava tê ,

gava diçe ,

û gava me

li gunehan hay dike…!!

di ramînim

çendî em di meşiyan ,

çendî em di beziyan ,

û çendî em

li hev di baniyan …

li ber ba û baranê ,

bi wan hestên gulgulî,

bi movikên çîroka evîna me





li ber dîmenên buhiştî,

xalên seyrangehan

û çavîkên ava xweş

ko ji kaniya dilan vêketî …

her ko em mezin dibin,

bibilê evîna me

gulsalekê ji xwe re dibe…

û her ramûsanên rojan

li dêmên temen pir dibin ;

sorgula hinarkan bêtir geş dibe ..

û her em

ji hev dûr dibin ,

em dibin rok û hîv

û evîna me dibe xak…;

dara miradan

li ser geş dibe…. !!

10/4/2000

## Dûriyê

**Dûriyê ..**

**heya min tu ne dît,**

**min tu tişt nizanî bû..!!**

**dûriyê ..**

**va min tu dît ;**

**lê hîn jî**

**ez tiştekî ji te nizanim**

**hey derya razan**

**hezar qirşikên weke min**

**li ber pêlên te diçin ;**

**winda dibin..**

**Duriyê..**

**xwezî me hev nasnekiriba..**

**û ew roja hevdîtinê**

**bela ne hatiba!!!**

**kesî heya niha ji te hez ne kiriye,**

**û bi sîngên te şa ne bûye ..**

**tal in , pûç in ,**

**danê xav in,**

**bi dijwarî tên xwarin..**

**dûriyê ..**

**bi vî riwê reş**

**beramberî hêviyan**





**pêta derdên te ,**

**dîwarê dilê min di kole..!!**

**dibe ko**

**volqanê bi teqîne ;**

**dibe ko**

**warê te bi çemê êgir**

**bi şewitîne.. !!**

**dûriyê**

**hey sitemkar,**

**bêdengiya te**

**bi her kesî di kare !!**

**hestan har dike ,**

**bêdengiya te**

**xwînê di kelîn e;**

**xwînê difûrîne ;**

**dike êzingê hêtûnê**

**can di de ,**

**jan di de ,**

**bê çare wê her bide ..**

**madem tu ev xwîn mijî;**

**kes bi te nikare**

**kes bi te nikare.. !!**

**27/3/2000**

## Xewne

**Gava**

**beniştê xezalan**

**li bênderên me kesk bû..;**

**gava**

**nîvişk û dew**

**li ser mersefa li ber me bû.. ;**

**gava**

**pîrka min**

**tolik û xerdel di da hev ,**

**û strîzerk di kland …**

**li wê buharê ,**

**li ber wê şahiyê ,**

**çavê min,**

**li ser bîrê ,li bejna zirav ket ,**

**guliyên dirêj ,**

**aniya geş weke rokê ,**

**rez û gul û dar**

**çav û poz,**

**dêm û dev û guhar**

**destê camcamî , gerdena dur ,**

**firişte li wê di zîvirîn … !!**

**ez bi wê cîhanê re çûm ,**





**ketim sawîran ,**

**destê nazik bi bazinan re ,**

**çavê min**

**li dûv xwe di zîvirand …!!**

**ronî ji her alî de ,**

**di bû birûsk û tav**

**pê re di lerizîm .. !!**

**bê çare ji hişyariyê**

**ez di dizîm ..!!**

**çi gotin min ne ma**

**di karî bû bi gota…..**

**laşê min ji ava bîrê**

**bêtir xwê di da …!!**

**ew kêlîk bû dîrok ,**

**pelek li ser**

**evîna keçînî vekir ..**

**bû şahî ,govendek li dor**

**her du dilan gerand …**

**me dest bi tevna hêlînê kir,**

**ji nişkave**

**min çavê xwe vekir ,**

**min dît ko xewne .. !!**

**lê her ez ne poşmanim .**

**evîna gundê min,**

**û kela dil, dîsa vêket ..!!**

## Çi me ez ?

Çi me ez ?
çi hêzim ,
ko karibim ba û pêlê
ji hev cuda bikim ?
çi dilim ,
ko çav û nerînê
ji dûrbînê ,
temaşeyê
rizgar bikim ?
çi şoreşim ,
ko nesrînê
ji evîna buharê ,
ji geşbîna birûskên dil
koçbar bikim ?
çi şiyarî me ,
ko xewna zarokekî
bi {lîska diz û xanî}
ji{çavgirtinkê}
şiyar bikim ?
çi me ez ?
çi me
çi darim





ko tenikbûna gula sor
di hêtûna biyaniyê de
bi çilmisînim ?
û çi denekî dînim ;
ko meya kevnar ,
di nêv nikilên
du kewên evîndar;
wek ba û avê
bikim kanî
û
bi herikînim ?

## Ax

Axê ,

xwîna sor

heyvana buhayê te ,

viyana rêdûrê te ye ... !!

di kele û germa evînê

di guhêze xwîna xwe ;

di kele û li ser

lêvên derdên te di rêse ..!!

dilek buhar e ,

û buhar tevna civanê

cegerxwînê te dihûne…!!

bi şehê dar,

serê peyxamê bi nazenîn;

ji a-b yê de di bêje:

nanê bi tisî li gel te ,

wek cewahir

xweşiyê bi didan di cû ..!!

li ser milê te ,

palgeha hevrîşmê

stranên qeralan ,

xewna paşan û wezîran





bi hestin tenik

evîna te ,

li ber bîna xwe di dêre …!!

Kewa hev cot,

li hêlîna xwe

di talda hêviyan de

xwedî dike ..

li burca belek

wek alekê dibîne..

di çaxê xwe de ,

di cihê xwe de ,

û di axa xwe de

du gul in , geş in

rengê hev didin…

qûç in , alal in

di sînga xuristê de ,

pirsa şayik ,

hêsrên germ

li ser dêmên jînê ..;

roj û meh ji hev didin ..

peyapey

bi zimanê kurmancî

pirs û bersiv didin…!!

10/11/2000

## Hevala min

Li bende berbangê,
roniya sozê
û nerîna peymanê ,
hevalê … hevalê …
kengî
ew dara , em civandin ,
wê qîrke stranê ?
bayê hênik ,
çarîka bûkaniyê
ji ser riwê te rakê ?
û heyva çarde şevî
hêlîna me
li sîwana xwe avakê ?
hevalê … hevalê …
kengî
li fala fincanê
zar û zêç bêne dîtin..?
û şevîna laleşê
perestina {feqîr û evdalê}
bihêre
evîn û kela germ
li dilê buhiştê …!!





Çem û çem
firişt rê bidin me …
û sawîrê hezkirinê
li ser gulên evîndar ,
li buhara em
lê bûn dost û yar,
asîmanekî vegirê;
hevalê … hevalê …
kengî ?
kew wê hev nekin dehfê ?
bira ji bira kînê ne ke ,
û li hev bikin silavê …
ji wan darên cuda
şaxên {Siyamend û Xecê}
bi bişkivin …?
û tev li hev bibin
li pizanê yek malzarokê ..!!
mêrg û çîmen
li ser dengê me geş bibin ,
êdî nêçîrvan ;
ne ma di tirsînin ,
pezkovî û xezalê
hevalê … hevalê … ?

1/12/2000

# Dilo

Dilo

gelek aza be ,

ji hêlîna baz bilindtir ,

min evînek

ji te re ava kir .. !!

Dilo

min got

û ez bi te şa bûm ,

ji buharê bêtir min ronî

ji te re diyar kir .. !!

bi deqa rokê

bazirganiyê bi karwanê

hêviyên te nakim … !!

padîşahê derya evînê ,

ji ser textê zêrîn

tucarî … te ranakim…!!





# EZÎZ XEMCIVÎN KÎ YE ?

- Ezîzê Xelîlê Xecê ye.
- Sala 1965an li bajarê Hisiça li rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê
- Xwendin: Dîploma elektrîk a navendî
- Ji sala 1982an de dest bi nivîsandina helbestê kiriye
- Sala 1985an helbesta wî ya yekem di kovara GELAWÊJ (hejmara 7an) de bi navê « Bê azadî nabe » belav bû
- Sala 1990î alfabêyek kurdî bi bi navê « A.Beya kurdî » belav kir
- Berhemên wî :

  1. Kenê pêçayî û henasene azad ……….{helbest in kurt}
  2. Çivîk difirin , Çivîk li ser darê ne……{pexşan}
  3. Hetav ne Leylan …………………………..{helbest}
  4. Zindana biçûk……………………………..{helbest}
  5. Helbestin mîjo……………………………..{helbest}
  6. Xemcivin û Anahîta ……………………..{pirtûkeke stranan}

Hemû berhemên wî neçapkirî ne.

Ta niha “Hetav ne Leyalan” û “Zindana biçûk” di malpera Amûdê hatine weşandin. „Çivîk difirin , Çivîk li ser darê ne » bo weşanê amade dibe..

Bo têkiliyê:

e-mail: xemcivin@amude.com
telefon: 0097 1505432948 (Abu Debi)